

Danezana gerdûnî ya mafên mirovî (*)

Wergêr: Dr. Kamîran Bêkes

Dumahîka Hejmarê Borî**Benda 19.**

Herkesî mafê azadiya bîrûhizrê û bîrderbirinê heye; di nav vî mafî de jî, mafê bê xwetêkilkirina tukesî hilgirtina bîrûhizran, herweha mafê bêyî nasîna tu sînoran û bi her cure navgînan li agahdarî û ramanan gerîn, wergirtin û weşandina wan.

Benda 20.

1. Herkesî mafê azadiya beşdarbûna civîn û komelên aştxwazane heye.

2. Nabe tukes bête neçarkirin ku bibe endamê komeleyekê.

Benda 21.

1. Mafê herkesî heye, rasterast an jî bi riya nimînendeyên xwe yên bi serbestî hîlbijartî, di rêvebiriya (hukûmeta) welatê xwe de beşdar bibe.

2. Herkesî bi awayekî wekhev mafê wergirtina kar û fermanberiyên giştî yên welatê xwe heye.

3. Viyana gel bingehê deslata hukûmetê ye; divê ku ev viyan xwe di hîlbijartinên azad û xulane (dewrî) de, yên li ser bingehê wekhevî û dengdana nehên an jî li gora awayeke din e hempa ku azadiya dengdanê misoger bike, diyar bike.

Benda 22.

Herkesî, wek endamê civakê, mafê ewlehiya civakî heye, herweha maf heye ku bi riya alîkariya niştîmanî (neteweyî) û hevkarîya navneteweyî û li gora yasa, destûr û hatiniyên her dewletekê, doza bidestxistina mafên aborî, civakî û çandî, yên ku ji bo rûmeta wî û geşbûna serbest a kesayetiya wî girîng in, bike.

Benda 22.

Herkesî, wek endamê civakê, mafê ewlehiya civakî heye, herweha maf heye ku bi riya alîkariya niştîmanî (neteweyî)

û hevkarîya navneteweyî û li gora yasa, destûr û hatiniyên her dewletekê, doza bidestxistina mafên aborî, civakî û çandî, yên ku ji bo rûmeta wî û geşbûna serbest a kesayetiya wî girîng in, bike.

Benda 23.

1. Herkesî mafê karkirin, bijartina azad a karê xwe, bidestxistina mercên karkirinê ên rewa û layiq û parastina li dijî bêkariyê heye.

2. Herkesî, bê cidahî, maf heye ku ji bo heman karî destmizeke wekhev bistîne.

3. Herkesê ku kar dike mafê destmizeke (mûçeyeke) rewa û têrker heye, destmizeke ku kari be ji wî û ji malbata wî re jiyaneke şayanê (layiq) rûmeta mirovî ewle bike û eger pêwîst be bi şiyânên (amrazên) din ên parastina civakî bête tewaw kirin.

4. Herkesî ji bo parastina berjewendiyên xwe mafê damezrandina sendîkan û ketina nav wan heye.

Benda 24.

Herkesî mafê bihndan (vehesîn) û demên vala û nemaze mafê sînorkirina hişmende a katên kar û mafê pişûdanên xulane yên bi destmiz heye.

Benda 25.

1. Herkesî mafê asteke jiyane ye ku têra ewlekirina tendurustî û xweşgozariya wî û ya malbata wî bike heye, nemaze têra ewlekirina xwarin, lixwekirin, mal, çavdêriya bijîşkî, wisa jî rajeyên (xizmetên) civakî ên pêwîst, herweha mafê ewlehiyê di rewşa bêkarî, nexweşî, seqetî, bîtî, pîrî an di rewşên, ji ber sedemên dervavî viyana wî, jidesdana amrazên jiyane.

2. Dayîktî û zaroktiyê mafê alîkarî û çavdêriyeke taybet hene. Hemû zarok, çi yên di zewacê de çi yên dervavî zewacê bûyî, divê xwediyê heman parastina civakî bin.

Benda 26.

Herkesî mafê hînbûnê heye. →